TaLe/Qismet

Yê rûj jinig nişti wel şûê xurak exward. Feqîrig (Hejarig) da le der maLyan. Jin eLisa, çü der waz kird u dî feqîrige. Jin çü ew naw ta xurak erê feqîrege bîyerê.

-Şü wet: Kîye?

-Jin cûwaw da: Yê feqîrige, xurak exwazim eray bûwem.

Şü nehişt jinege xurak bûwad. Hay kare bîye qisyêg nawnî î pîyage u î jine, ta axerê we teLaq resîn.

Çen saLig guzeyşt, jinege le nû şü kird. Rûjig nişti e wel şüegey xurak exward, dirya le deregeyan, şûê çü der waz bikad dî feqîrige ke atac (ihtîyac we) xurak dîrê.

Şü çü ew naw u wet e jinê:

-Jinim xurakig erê hay feqîre (tasûker) bûwe.

Jin we yê gilew eLisa u xurak bird erê feqîre, imca, jin we çewel pirr le esr hat ew düya.

Şü wet e jinê:

-Jinim, çe e pêd hatiges, era egîrid?

Jin wet:

-Feqîrege (Kemdes) yarû le der maLman bü, şü qedîmiyegem bü.

Pîyag jin girt e bexeL, nûrî e pê u wet:

-Minîş ew feqîregem ke ew rûje hatim e der maL şüd.

Hüç wext zemane we kemî (des kemî) negir!!!!

Seywan Qember (www.feyli.se)